Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1319 | 26-Cotmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/


Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Huner parçeyek ji giyanê mirov e

Ayşa Silêman/ Dêrik

**Lîlan Cûma jineke ciwan ji bajarê Qamişlo ye. Ew bi dest û xeyalên xwe peykeran bi têlan çêdike. Peykersaza jin Lîlan Cûma diyar kir ku huner parçek ji giyanê wê ye lewma her hestekî ku jiyan dike bi rêya peykeran tîne ziman.**





Lîlan Cûma di 30'ê Îlona sala 2000'î li bajarê Qamişlo ji dayîk bûye, ji zarokatiye xwe ve heya roja îro li bajarê Qamişlo dijî. Ji sala 2024'an ve piştî qedandina refa 12'an wê dest bi karê hunerê kiriye û bitaybet berê xwe daye çêkirina peykeran bi têlan da ku bi riya wan peykeran hemû hestên xwe bîne ziman.
Di derbarê jiyan û çêkirina peykeran bi têlan peykersaza jin Lîlan Cûma ji Rojnameya me re axivî.

**'Piştî qonaxa xwendina amadehî peykersazî bala min kişand'**

Lîlan Cûma da zanîn ku hertişa girêdayî hunerê bala wê dikşîne, jê hez dike û wiha got: "Hîn ez zarok bûn di dibistanê de min wêne xêz dikirin, malbat û mamosteyên min dîtin çiqasî ez bi eşq wan wêneyan çêdikim, lewma bi min re bûn alîkar. Dema min kêfxweşiya li ser rûyî wan didît min biryar da ku ez dev ji vê talînet bernedim da ku ez hertim rûyê malbata xwe wiha bibînim. Piştî ku min refa 12'an bi dawî kir êdî min xwe pêşxist û biryar girt ku tiştekî cûda çêbikim. Min ev huner ji kesekî biyanî girt dema min karê wî dît yekser bala min kişand. Êdî min xwe fêr kir, çend caran min peryker wek tecrûbe çêkirin êdî kêfa min jê re hat û min di çêkirina wan de rehetiyek dît. Her du birayên min yên ji min mezintir destek dan min da ku ez serkeftî dest bi vê hunerê bikim. Astengiya ku ez dibînim di milê çêkirina peykeran de ye, ji ber ku ez bi têlan çêdikim lewma pêwîst e ez gelek baldarbim da ku ez destê xwe birîn nekim. Rast e ev kar ne hêsa ne, lê dema ez peyker bi dawî dikim û wê keda xwe dibînim ez westandina xwe jibîr dikim."

**'Her peykerek xwedî çîrok û wateyeke'**

Peykersaza jin Lîlan Cûma axaftinên xwe bidawî kir û wiha got: "Heya niha ez tevlî tu pêşengehan nebûme karê ez dikim tenê ez li ser malperên xwe yên şexsî belav dikim. Ez hemû peykerên xwe kom dikim da ku pêşengeheke taybet bi xwe vekim. Her peykerek ez heftiyekî pê ve mijûl dibim, her yek ji wan xwedî wate û çîrokeke cûda ye. Bûyerên ku mirov têre derbas bûyî ez dikim peyker, herwiha dema hin kes ji min dixwazin jî ez ji bo wan çêdikim. Di heman demê de hestên ku ez jiyan dikim jî ez bi riya peykeran vedibêjim. Hêviya min ew e ku ez tevlî pêşengên cîhanî bibim û hertim tiştên nû fêr bibim. Her peykerek buhayê wê li gor mijûlbûna ku ez pê ve dimînim. Di heman demê de gelek kesên biyanî jî malpera min dişopînin û moralê min bilind dikin da ku ez karê xwe berdewam bikim. Daxwaza min ew e ku gelê Rojavayê Kurdistanê destek bidin ciwanên xwe da ku bikaribin gavên serkeftî bavêjin, ji ber ku her mirovek kedeke pîroz dide."

## Gotina Dawî



### Talîzoka li Sûriyê!

Mihemed Seydi

Ev zêdetirî 12 sala ne ku axa Sûriyê û xelkê wê di nava pençên kom û berjiwendiyên dewletan de perçe perçe bûye. Heta beriya ku rêjîma Baas jî hilweşe, talanî û revandina mirovan zêde bû û her rêwiyekî bi riyekê de biçûya, diviya bû destê wî li ser dilê wî bûya heta ku bi saxlemî bighîşta cihê xwe. Ev jî zêdetir êşa Kurdan bû ku piranî ji ber nexweşiyan berê xwe didan bajarê Heleb û Şamê ku li wir Doktorên baş û Nexweşxaneyên mezintir hene. Piştî hilweşîna rêjîmê jî ev êşa xelkê bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi taybet Kurdan kêm nebûye. Careke din rê li pêşiya xelkê hatine girtin û komên ser bi desthilata Şamê ve rê nadin Rêwî ji herêmên di bin parastina QSD'ê de derbasî yên din bibin. Tevî ku di destpêka Cotmehê de eşkere bû ku şandeyeke Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi serokatiya fermandarê QSD'ê Mezlûm Ebdî li Şamê bû û li ser van mijara lihevkirin çêbûye, lê girtina riyan dewam kir. Ev jî dihêle ku xelk bibe bazara di destê ajokar û qaçaxçiyan da ku wan di riyên çol re derbas bikin. Hefteya derbasbûyî jî ji ber rê bi satirên axê hatibûn girtin, gelek ajokaran tevî rêwiyan li pêşiya bendên komên ser bi desthilata Şamê ve xwepêşandan kirin û bi zorê xwe li bendan qelibandin û derbas bûn. Heta niha jî hincetên girtina van riyan nehatine gotin, lê hin alî dibêjin ku ev komên ser bi dewleta Tirk ve ne, ku van riyan digrin û ew heman alî ne ku dor li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê jî girtibûn. Lê gelo Ehmed El-Şerie ku xwe desthilat dibîne li ku ye?
Li aliyekî ev desthilata Şamê dibêje wan Wezareta Parastinê ava kirine û hemû kom beşek jê ne, li aliyê din bi hinceta ku ev komên riya xelkê digrin ne di bin kontrolê de ne, dixwaze xwe ji vê berpirsyariyê bide alî. Li aliyekî bi QSD'ê re li hev dike ku aloziyên heyî bi diyalogê çareser bike, li aliyê din êrişên li dijî Kurdan gur dike. Li aliyekî behse welat û dewletê dike, li aliyê din nikare kontrolê li ser yek komên girêdayî xwe jî bike.
Li Bakurê Sûriyê û bi taybet li Heleb û derdora wê, kom bi fermana dewleta Tirk tevdigerin. Li Idlibê, komên Ozbekî, Tirkstanî û Oygur jî bi fermana kê tev digerin nexuyaye lê ew jî niha ne di bin desthilata HTŞ'ê de ne. Ev yek jî di nîvê vê mehê de diyar bû, dema hêza bi navê Ewlehiya Giştî ya ser bi Şamê ve xwestin çeteyên Frencî yên di Kampa Franciyan yên li Idlibê bigrin. Van çeteyan li dijî desthilatê li ber xwe dan û şer derket. Di dawiyê de jî bi navbênkariya çeteyên Ozbekî, lihevkirin hat çêkirin.
Tevî vê jî ev desthilata veguhêz a li Şamê ku li şûna Baas'ê rûnişt, dibêje ku ew dixwaze bibe serwerê hemû axa Sûryê û bi vê hincetê êrişî Beravê û Siwêdayê kir. Derheqê Elewî û Durziyan de komkujî pêk anînin û dema erd lê teng jî dibe, dibêje ev komên ne di bin kontrolê de ev komkujî pêk anîne.
Li aliyekî dibêje ev komên ne di bin kontrola wan de van komkujiyan dikin û li aliyê din dibêjin wan Artêşa Erebî ya Sûrî ava kirine. Lê dema em bala xwe didinê, Artêşa wan a heyî ku jêre jî dibêjin EREBî, ji Ozbekî, Tacakistanî, Oygur, Francî û hwd pêk tê. Qaşo Artêşe, lê kontrola komên di nav de ne di destê wê de ye û dema nava wê û komekê de jî pirsgirêk derket, Ozbekî bûn navbênkar. Wê demê wê çi xêr ji vê desthilatê hebe?
Lewra, mirov dikare pir bi zelalî bibêje ku Sûriya di nava kaos û tevliheviyeke mezin de ye, Talîzoka mezin radibe û destê kê di bêrîka kê de ye, ne diyar e. Lewma ya herî berbiçav û baş ew e ku QSD'ê herêmên xwe diparêze û rê nade talîzok derbasî nava cih û Xelkê wê bibe.

Sudoku:Pirs 63

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | | | 7 | | | 2 | | |
| 7 | | | | | 8 | 3 | 9 | 4 |
| 9 | | | | | 1 | | | |
| | 5 | | | 4 | 2 | 6 | | 9 |
| | | | | | | | | |
| 6 | | 4 | 3 | 9 | | | 1 | |
| | | | 8 | | | | | 2 |
| 8 | 6 | 5 | 9 | | | | | 7 |
| | | 9 | | | 3 | | | 6 |

Sudoku: Bersiv 62

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 7 | 3 | 6 | 2 | 1 | 5 | 8 | 9 |
| 2 | 9 | 1 | 8 | 4 | 5 | 6 | 7 | 3 |
| 5 | 6 | 8 | 7 | 3 | 9 | 4 | 2 | 1 |
| 3 | 4 | 5 | 9 | 1 | 2 | 7 | 6 | 8 |
| 7 | 8 | 9 | 4 | 6 | 3 | 2 | 1 | 5 |
| 6 | 1 | 2 | 5 | 7 | 8 | 3 | 9 | 4 |
| 9 | 2 | 4 | 3 | 8 | 7 | 1 | 5 | 6 |
| 8 | 3 | 7 | 1 | 5 | 6 | 9 | 4 | 2 |
| 1 | 5 | 6 | 2 | 9 | 4 | 8 | 3 | 7 |

## FERHENGA BIWÊJAN

### LI SER KESÊ PIR DIGERE

**Civat li mala Fatê ye, Fatê li mala Xatê ye:**
- Em diçin mala wî, ew diçe dereke din.
(Kesên li malên xwe pir nasekinin ji bo wan tê gotin)
**Deşt û zozan dan ser piyekî:**
- Pir geriya; li her derê geriya.
**Deşt û zozan dan ser piyê xwe:**
- Bi heman wateyê.
Em çûn mala Fatê, Fatê çû civatê:
- Bi heman wateyê.
**Heta min dît çavê min derket:**
- Ez pir lê geriyam.
**Kefgîrga taxê ye:**
- Gerok e; li her derê digere.
(Ji ber kêmbûnê, berê gundiyan ji bo tevdana mehîrê kefgîr dida hev)
**Tu dibêjî qey hêk pê re ne:**
- Li ciyekî natebite.
(Mirîşka hêk pê re be natebite)

### LI SER PIRGOTIN Û PIRAXAFTINÊ

**Bi zimanê xwe nikare:**
- Pir diaxive; hema çi tê ber devê wî dibêje.
**Çi tê serê quling ji qarîna quling e:**
- Dema ji ber axaftina zêde pirsgirêk ji yekî re derdikevin hingê tê gotin.
**Dev geriyan, ezman geriyan:**
- Pir axivîn; demeke dirêj axivîn; behsa her tiştî kirin.
**Devê wî nakeve hev/devê wî nakeve ser hev:**
- Pir diaxive.
**Dilopan dike:**
- Axaftinê qut dike; axaftina civatê xirab dike.
(Dema hin çîrokan dibêjin, yan dema hin diaxivin û yek xwe dixe nava axaftinê hingê tê gotin)
**Ez mejîreş kirim:**
- Pir axivî; belaya xwe ji min venekir; di serê min de kir pitepit.
**Guhê min bir:**
- Serê min êşand; pir axivî; xwestekên xwe pir dubare kirin.
**Guhê min qul kir:**
- Bi heman wateyê.
**Ji ziman pêve nîne:**
- Pir diaxive lê tiştekî nake.
**Kir werîs:**
-Pir dirêj kir
Ma te civat kiriye?
- Tu çima rê nadî hin din jî biaxivin?

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Pêwîstiya dibistanên kampên Waşokanî û Serêkaniyê bi pêdiviyên sereke hene'



Berdevkê dibistanên kampên Waşokanî û Serêkaniyê Mihemed Haco diyar kir ku li her du kampan 6 dibistan hene û 6 hezar xwendekar di wan dibistanan de dixwînin. Herwiha Haco destnîşan kir ku pêwîstiya dibistanên her du kampan bi pêdiviyên sereke heye.**R-6**

## 'Pêwîst e sîstema navendî û qirkirin bi dawî bibe'



Hevserokê Ofîsa Giştî ya Têkiliyên Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Silêman Ereb diyar ku pêwîst e hikumeta veguhêz a Sûriyê li gel guhdar bike û got, "Beriya her tiştî pêwîst e peymana 10`ê Adarê bikeve piratîkê de û hikumeta veguhêz gavên erênî biavêje ku hemû pêkhate cihê xwe di rêvebirina Sûriyê de bigrin."**R-4**

## 'Armanca hikumeta veguhêz a Sûriyê pareçekirina Sûriyê ye'



Endamê Rêveberiya Kongreya Islama Demokratîk Ebdulkerîm Saroxan diyar kir ku ji dema hatina hikumeta veguhêz a Sûriyê ser desthildariyê kiryarên wê li dijî gel ranewestiyan ne û got, "Armanca hikumeta veguhêz a Sûriyê parçekirina Sûriyê ye."**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1319 | 26-Cotmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# ŞEHÎD BÊRÎTAN BÛ DENGÊ BERXWEDANA JINÊN APOYÎ

Şehîd Bêrîtan li dijî dagirkeriyê û hevkarên wê teslîmiyet qebûl nekir, canê xwe kir dirûşme û bangek ji bo rêya têkoşîn û berxwedanê. Bêrîtan felsefeya azadiya jinê, pîvanên jiyanê yên Rêber Apo temsîl kiriye, di pêşvebirina artêşbûna jinê de jî, bû çavkaniya hêz û têkoşînê.**R-2**



## Ji çiraxên wêjeya Kurdî




Helbestvan Hadî Behlewî stûneke torevanî ya bilind û bejneke çandî ya berz e. Dibe ku laş di bêdengiyê de biçe, lê dengê wî yê helbestî hîn jî li cihê xwe dimîne, rêyan ronî dike û navê wî di bîra neteweya Kurd de xêzkirî dimîne wekî çiraxa ku qet venamir e.**R-7**

## Avabûna tevgera siyasî ya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê.... (1)



Tevgera Kurdî ya siyasî li Rojavayê Kurdistanê di bingeha xwe de ji rewşenbîrên Kurd hat avakirin, bi navê Xoybûn komeleyek ava bû, ji hişmendiya netewî û siyasî re bû bingeh, da ku yekem partiya Kurdî di sala 1957'an de were damezrandin û piştre parçe bibe. Tevgera siyasî ranewestiya, lê piştre gelek partî hatin avakirin.**R-3**



Şoreş û Rojava
Sînan Cûdî R-4



Dema ku vîn li gorî sponseran be hêvî bê wate dibe!
Idrîs Henan R-5



Yekê Mijdarê û Kurdistan
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

# Şehîd Bêrîtan: Jina Kurd teslîm nabe û îxanetê nake

Yek ji fermandarên YPJ'ê Viyan Kobanê diyar kir ku şehîd Bêrîtan ji ber êşa jina Kurd û hemû jinan dizanîbû îxanet red kir û bi gotina ku “Jina Kurd tu carî teslîm nabe û îxanetê nake" çalakiyeke fedayî ku bû mîrasê hemû jinan pêk anî û got: “Di şoreşa Rojava de YPJ'ê xeta Bêrîtan bingeh girtiye."

**Ronahî Sadûn/Hesekê**

Jin di nava dîroka helandinê de bê nasname û îrade jiyan kirine, her dem li hemberî xwe dagirkerî û desthilatdarî dîtine, bi taybet gelê Kurd bi tevahî ev yek ji dîrokê heya roja îro dijîn û li hemberî wê berxwedaniyê dikin. Lê jinên Kurd ev yek li ser xwe qebûl nekirine û li pey lêgerîna rastiyê têkoşînên mezin ku destanên lehengiyê di dîrokê de neqişandine, nivîsandiye. Jina kurd ji bo isbatkirina nasnameya hemû jinan berdêlên giranbuha dane û rêya azadiyê nîşaneyî hemû jinan kiriye. Di heman demê de daye isbatkirin ku jin dikare di her warî de xwedî biryar û kar be. Dîroka Tevgera Azadiyê jî ev yek bi zelalî nîşanî hemû cîhanê da, bi taybetî jinên di nava vê tevgerê de cihê xwe girtin her yek çîrokeke qehremaniyê nivîsandiye û rêya pîroz a azadiyê li pêşiya jinan vekiriye. Yek ji wan jinên têkoşer, qehereman, wêrek, bedew û azadîxwaz Şehîd Bêrîtan e ya ku li ser xwe teslîmiyet qebûl nekir.



### Bêrîtan romana serdemê ye

Bêrîtana ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk û hevkarên wê teslimiyet qebûl nekir û şehîd bû, canê xwe kir dirûşme û bangek ji bo rêya têkoşîn û berxwedanê. Wek efsaneyek di dîroka şoreşa azadiya Kurdistanê de cih girt. Li ser navê wê stran, roman, helbest û film hatin çêkirin. Ji çalakiya Bêrîtan gelek encam hatin derxistin. Yek ji wan jî jinên Kurd ber bi artêşbûnê ve çûn. Artêşek ku bingeha xwe ji çalakiya Bêrîtan digire YJA-STAR hat avakirin.

### Li ser çiyayan destanên qehremaniyê jidayik bûne

Li hembêza çiyayê Xakurkê lûtkeyek bi navê Şekîf heye ku yek ji lûtkeyên herî bilind ên çiyayên Kurdistanê ye. Niha navê xwe guheriye bûye Şehîd Bêrîtan. Lûtkeya wî çiyayî qada çalakiya canbexşane ya Şehîd Bêrîtan û bi dehan destanên qehremaniyê yên gerîlayên azadiyê ne.

### Mirina birûmet ji jiyana bêrûmet birûmetire

33 sal ji beriya niha destên reş ên xiyaneta navxwe Şehîd Bêrîtan gihand vê çarenûsê ku yan wê mirinek bi şeref û serfirazî bi hilbijarta yan jî wê radestbûna xiyanetkaran hilbijartiba. Lê Şehîd Bêrîtan mirinek bi rûmet hilbijart û radestbûnê qebûl nekir.

### Kurtejiyana jina Fedaî Bêrîtan

Bêrîtan bi nasnav Gulnaz Korataş di sala 1971’an de li Bogilan a Çewlîkê ji dayîk dibe, dibistana seratayî, navîn û amadehî li El-Ezîzê dixwîne, El-Ezîzê wê demê cihê paşverûtî, Olperestî û nûjadperestiya Tirkiyê bû. Gulnaz di sala 1988’an de zanîngeha Stenbolê beşa zanistên Aborî qezenc dike. Elewiyên ku li El-Ezîz bûn, piştî derbeya faşîst a 12’Îlonê ji ber nasnameya xwe ya Olî hîn zêdetir rastî êrîş û çewsandinan hatin, ev jî dibe sedem ku dilsoziya Gulnaz ji tevgerên şoreşger di temenek ciwan de dest pê bike, ev navgîna bi nakok û aloz di kesayeta Gulnaz de taybetmendiya berxwedanê ava dike. Gulnaz Karataş di sala 1990’î de beşdarî nava tevgera azadiya Kurdistanê dibe, lê ji bo xebatên rêxistinkirina gel, vedigere Tirkiyê û li Stenbolê dest bi kar dike. Gulnaz Kerataş di demeke kin de fêrî zimanê Kurdî dibe û di nava gelê kurde tê hezkirin. Piştî demekê ji xebatên gelêrî, di heman salê de di encama operasyoneke dewleta Tirk de li gel hin hevalê xwe, tê girtin. Tevî ku di girtîgehê de tê êşkencekirin li ber xwe dide û tu tiştî li ser xwe nabêje, herwiha ji ber kêmbûna delîlan demekê di girtîgeha Bayram Paşa ya Stenbolê de tê hiştin û piştre tê berdan.

### Bêrîtan yek ji gerîlayên şikenandina êrişên xayinên ku hevkariya dijmin kirin

Bêrîtan di pêşvebirina artêşbûna jinê de, bû çavkaniya hêz û sûdwergirtinê, di şerê li dijî dewleta Tirk û hêzên kevneperest de berxwedaniyeke bê hempa da meşandin. Di sala 1992’an de û di encama peymaneke di navbera dewleta Tirk û PDK ê ya bi armanca tunekirina Tevgera Rizgariya Kurdistanê de, dewleta Tirk dest bi operasyoneke leşkerî li dijî gerîlayên li çiyayên Kurdistanê dike, bi hezeran PDK’ê tev li operasyonê dibin. Bêrîtan îsrar dike ku tev li bersivdayîna vê oprasyonê bibe û bû yek ji gerîlayên şikanandina êrişên xayinên ku hevkariya dijmin dikin.

Bêrîtan Hêvî ku li çiyayê Lêlkan a Xakûrkê li dijî hêzên noker şer dike û guleyên wê xilas dibe, wê demê ji aliyê pêşmergeyan ve tê dorpêç kirin û dixwazin ku teslim bibe. Lê ew xeta berxwedan û rûmetê hildibjêre. Şehîd Bêrîtan 25’ê Cotmeha 1992’an, heta fîşeka xwe ya dawî şer kir û ji bo nekeve dest dijmin xwe ji zinaran avêt. Ew dibe ji kevirên bingehîn a “Artêşbûna Jinê” û sembola berxwedanê.

Bêrîtan felsefeya azadiya jinê, pîvanên jiyanê yên Rêber Apo temsîl kiriye. Helwest û çalakiya Bêrîtan bandoreke mezin hem li ser gelê Kurd, hem jî li ser hêzên kevneperest kir. Navê Bêrîtanê dibe helbest û stran, lê ev jî têra vegotina têkoşîna Bêrîtan û meznahiya wê nake.

Derbarê salvgera şehadeta şehîd Bêrîtan û girîngiya domandina xeta wê ji bo jinan, yek ji Fermandarên YPJ’ê Viyan Kobanê ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Bêrîtan artêşbûna jina azad e’

Viyan Kobanê diyar kir ku Bêrîtan ruhê jiyana berxwedêr e û wiha got: “25’ê Cotmehê salvegera şehadeta şehîd Bêrîtan e. Bi boneya salvgera şehadeta şehîd Bêrîtan re “Artêşbûna Jin” hate avakirin, ev roj ji bo me rojekî pir girîng û bi wate ye. Lewra di şexsê fermandara mezin, rêhevala dozê a ku em rêya wê dişopînin ku ew ruhê jina berxwedêr e, tevahî jinên berxwedên ku cane dan û xwe feda kirin bo doza jinên tevahî cîhanê di şexsê jina Kurd de, tevahî jinan bi serbilindî têkoşîn kirin û gihiştin asta şehadetê, em wan bi bîr tînin û bejna xwe li hemberî wan ditewînin. Di heman demê de em tevahî şehîdên şoreşê di şexsê şehîdên jin de ku li her derê berxwedanî li hemberî zilm, zordarî û zihniyeta desthilatdar ya baviksalarî kirin û şehîd bûn, em bi rêzdarî wan bi bîr tînin. Herwiha di vê rojê de em soz û biryara xwe careke din nû û xurt dikin ku em ê layiqî wan derkevin.”

### ‘Em şoreşgerên jin ên sosyalîstin’

Viyan Kobanê şehîdên êşqa azadiyê bi bîr xist û wiha pê de çû: “Ji bo hemû gelan, ji bo azadiya Kurdistanê, Rojhilata Navîn û cîhanê ê ku bi vê eşqê, baweriyê, îradê û hêzkirinê canê xwe dan, em wan bi bîrtînin. Herwiha soza me ev e ku em ê di rêka wan de weke şoreşgerên jin û sosyalîst ku di xeta azadiyê û sosyalîstê de ne bimeşin. Rêber Apo dibêje: “Divê di xeta sosyalîzmê de meşandin li gorî pîvan, têkoşîn û heqîqet be.” wek jinekê şoreşger vê rêkê meşandin yek bi zanistî, dîroknasîn û li ser wê bingehê gihaştina heqîqeta xwe ye, wek jin jî divê em di vî alî de bi bîr û bawer bin.”

### ‘Xeta Bêrîtan hêza jinê ye’

Viyan Kobanê eşkere kir ku ew hêza xwe ji xeta Bêrîtan digirin û anî ziman: “Her tim em hêza xwe ji têkoşîn, berxwedan û şehdadeta şehîd Bêrîtan digirin. Ew ji bo me mijarekî esasî ye. Ya din em behsa artêşbûna jin bikin, gelek artêşên jin di cîhanê de hene, lê yê ku berxwedanî kirine û gîştine astekê ku heta niha têkoşîna xeta wê tê meşandin berxwedaniya jina kurd rêheval Bêrîtan ku bi nav Gulnaz Karataş e. Di şexsê şehîd Bêrîtan de Rêber Apo biryara avakirina artêşbûna jin da ku di şexsê wê de pêwîstiya avakirina vê artêşbûnê dît. Di şoreşa Rojava de jî hêza YPJ’ê mîna YJA Star Bêrîtan ji xwe re nimûne girt û wê bingeh dît. Li ser vê bingehê di şoreş Rojava de avakirina artêşa YPJ’ê û xwerêxstinkirin ji bo me mijarekî bingehîn e. Armancên artêşbûna jinbûnê yan jî têkoşîna jinan armancekî, ji bo azadiya hemû jin û gelan e, heval Bêrîtan jî nimûneya vê ye.”



### ‘Bêrîtan teslîm nabe û îxanetê nake’

Viyan Kobanê da zanîn ku şehîd Bêrîtan teslîmiyet ji bo dijmin û neyaran red kir û wiha got: “Şehîd Bêrîtan di sala 1992’an de li Xakurkê bi siloganên “Bijî Serok Apo, jina Kurd tu carî teslîm nabe û tu carî îxanetê nake.” Çalakiyeke fedayî ku xwe ji zinaran avêt pêk anî. Bêrîtan bîr, bawerî û hezkirin xwe ji Rêber Apo girtî. Dewleta Tirk bi desteka PDK’ê yê ku hatin heval Bêrîtan re gotin; ka teslîm bibe heval Bêrîtan teslîmîyet qebûl nekir. Bêrîtan jina ku hêza xwe ji dîroka bi êş digire, ji ber ku dizan ew xwediyê dîrokekî pir bi êşe, ewqas dewlemend û ewqas berxwedanî ye, ji ber ku di komkujiya ku li ser gelê Kurd û gelan hatiye kirin, zilman ku li ser gelan hatiye kirin, bi taybetî li ser jinan û di zindanan de hatîne kuştin, revandin û nasnameya wê nehatiye dîtin. Ji bo vê şehîd Bêrîtan hêzekî vê rengî jî dîroka xwe girtiye.”

### ‘Jina ku bixwaze azadiyê jiyan bike bela xeta Bêrîtan bişopîne’

Viyan Kobanê axaftina xwe wiha qedand: “Têkoşîna şehîd Bêrîtan ji bo me hemû jinan mîrase ku em xeta xwe li ser wê mîraseyê bidomînin û mezin bikin. Niha bi şoreşa Rojava re avabûna hêz û artêşbûna YPJ’ê li ser bingeha neteweya demoratîk, rêxistinbûyîneke xwe ya xurt ava kiriye û bûye parêzvanên hemû jinan. Li car aliyên Kurdistanê Bakur, Başûr, Rojava, Rojhilat û her derê cîhanê jinan ku bixwaze azadiyê bibîne an jî jiyan bike, bela xeta şehîd Bêrîtan ji xwe re bingeh bigre. Di şoreşa Rojava de armanca me ew xwerêxistinkirina jinan di aliyê leşkerî, birdozî û her alî de esase. Li ser vê bingehê em deyndarin ku em dengê xwe bidin û li gorî vê tev bigerin, têşkoşîna xwe dewam bikin û xurt bikin. Em rêya Bêrîtan pîroz dikin û em ê vê rêyê bidomînin.”



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsif**

Helbestvan Hadî Behlewî stûneke torevanî ya bilind û bejneke çandî ya berz e”.

Rola torevan û nivîskarên kurd tenê bi nivîsandina wêjeyî, tomarkirina peyvan an jî vehûnandina helbestan sînordar nema, ji wê derbas kir û bûye kiryarek neteweyî û çandî ya rastîn, wan li ser milên xwe girtiye parastina bîra gelê kurd, vêxistina şemala ramanê neteweyî û vejînkirina nirxên resen ên kurdayetiyê û roleke girîng lîstin di parastina mîrasa çandî de, him di pêşxistina nasnameya neteweyî û di parastina zimanê kurdî de ji wendakirin û bîrçûnê, da ku wêjeya kurdî bimîne pirek paşerojê bi dema niha û pêşerojê ve girêbide û asêgehek ku ba û bahozên demê nikarin wê bilivînin.

Di vê çarçoveyê de, helbestvan Hadî Behlewî wek yek ji wan helbestvanên neteweyî yên herî navdar xuya dibe , yên ku dane li ser milên xwe barê peyvê û xewna azadîyê, wî pênûs û dengê xwe kirin di xizmeta gelê xwe û daxwaza wê de, xîmava pênûsa xwe kir xêzên ji ronahiyê, pê çiraxan vedihûne û di şevên reştarî de rêya têkoşînê ronî dike, û hêvîyê di dilên nifşên pêşerojê de diçîne .

Di dilê Qamişloyê de, bajarê evîn, aşîtî û biratiyê û hevzêriya olên asmanî di dirêjahiya dîrokê de, ew bajarê ku bi cihêrengiya xwe ya çandî zîndewar û bi mîrasê xwe yê kevnar û dirêj ku ji Mîtanî û Huriyan ve destpêdike, helbestvan û nivîskarê kurd Hadî Behlewî di16’ê Gulana 1948’an de li gundê “Girzînê” yê girêdayî bajarê Qamişlo, ji dayîk û bavek kurd (Mela Şêxmûs û Zeyneb) hate dinyayê. Ew di himbêza malbateke kurd a welatparêz û oldar de mezin bû, ku girêdayî bi nirxên resen yê kurdayetiyê, ku di dilên zarokên xwe de tovên xweparêzî û nasnameyê, hezkirina xakê û dilsoziya ji bo welat çandiye, ew kurê zanyarê kurd ê mezin û kesayetiya neteweyî, Mela Şêxmûs Qerqatî ye, yek ji pêşengên avakirina bingehên hişmendiya mirovahî û neteweyî di dirêjahiya salan li herêmê ye, li wir li dijî zulmê û neheqiyê têkoşîn kir û li aliyê zarokên gelê xwe sekinî di rûyê zulm û zordariya hêzên rejîma Baas a Sûriyê de, û di heman demê de li dijî hewldanên çewisandina hebûna kurdî, nasnameya neteweyî û zimanê kurdî li Sûriyê rabû, wî di gel Cegerxwîn û Şêxmûs Şêxê Partiya Azadî di sala 1958’an damezrand .

Hadî di himbêza Qamişloyê de mezin bû, di nav jîngehek dewlemend de ku bi nirxên neteweyî û olî tije bû, bi cihêrengiya çandî û neteweyî xwe ronak bû ku bûye û hîn jî maye wek dergûşa olên asmanî û şaristaniyê, mêrga zanîn û zanistê, çavkaniyeke çand û hunerê û dîdargeha helbestvan, torevan û nivîskaran, mîna Cegerxwîn, Mela Ehmed Palo, Mela Nûrî Hesarî, Xelîl Sasûnî, Can Şemas, Seydayê Dilbirîn, Selîm Hanan û yên din.

Di vê qada jiyanê de, hişmendiya wî ya torevanî mezin bû û wijdana wî ya helbestî avabû û wî vexwart ji çavkaniya wê ya hunerî ya xemilandî bi navên nejbîr ku di bîra kurdan de hatine kolandin mîna; Mihemed Şêxo, Seîd Yûsiv, Aram Tîgran û Yûsiv Ebdilkî, ku karên wan bingehên nasnameya hunerî û çandî ya kurdî avakirin.

Bi vî rengî, wî xwe ji zarokatiyê ve dît dorpêçkirî di nav qadeke dewlemend ku hevrêziyê dike di navbera helbest, muzîk û hunerê de, ev yek hestê bedewî û ramyarî li cem wî xurt dike û amade dike ku bibe yek ji dengên resen ên kurdî, yên ku peyamê diparêzin û ji bo dîrokê dinivîsin. Wî zaroktiya xwe li gundê “Girzînê” derbas kir, di navbera zeviyên keskîn û û asmaneke fireh de ku deriyên xeyalê ji bo wî vedikirin, wî guhdarî çîrokên dapîran di şevên zivistanê yên sar de dikir ku bi xêzên paşerojê dihatin vehûnandin û bi bavê xwe re di nav zeviyan de digeriya, fêm kir ku ax jî rûhek heye û dar jî bîranînek heye û kevir jî di bêdengiyê de peyamê dida ku ji her axaftinê çêtir e.

Di malbateke olî û neteweyî de, hişmendiya wî ya pêşîn li ser çîrokên qehremaniyê, stranên dawetan û sirûdên cotkaran ku bi dengê bayê re tê tevlihevkirin, ew mezin bû, ji malbata xwe ya resen wî nirxên kurdayetî, xwecîtiyê, rûmet, rastî û pîroziya peyvê wergirt. Lê dibistana wî ya yekem xweza bi xwe bû, ew ji xuşxuşa kanîyan, ji çîvçîva Çûkan, vîzevîza bayê di navbera gir û kendalan de, fêm kir ku jiyan zimanek heye ku nayê nivîsandin, lê di hundirên dilan de tê hestkirin.

Ji vî cihê xwezayî, deriyên mîrasa devkî li pêşiya wî hatin vekirin mîna, stranên çiyayî, destanên gelêrî, û çîrokên ku çîrokvan vediguhezin ji nifşekî ber bi nifşek din ve.

Ji vê çavkaniya destpêkê wî vexwar, berî ku ber bi rêyên herî fireh ve biçe, ku li ba wî helbest bû dengê axê, belgeyeke nasnameyê û çekek di rûyê jibîrkirinê de.

Wî qonaxa seretayî li gundê xwe “Girzînê” xwend, û ya navîn li Qamişloyê di sala 1962’an qedand û ya amadeyî li Hesekê di sala 1965’an de dawîkir, Paşê Peymangeha amadekirina mamosteyan li Hesekê xwend û di sala 1968’an de jê derçû, berî ku li Zanîngeha Halebê kulîjeya wêjeya Erebî bixwîne û biqedîne.

Hewesa wî ya wêjeyî û çandî ji zarokatiyê ve dest pê kir, ku ji deng û helbestên pêşeng û helbestvanên kurd bandor bû wek Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Mela Ehmedê Palo … hwd. û di sala 1965,an wî dest bi nivîsîna helbestan bi zimanên Kurdî û Erebî kir û bi vî awayî geşteka dirêj ya derbirîn û gotinê destpêkir, wî helbest bi hemû şêwazên wê nivîsî, ji helbesta klasîk ya terazû heta bigihê helbesta nûjen ya azad û pexşan, ji ber vê yekê, peyva wî bû neynika ezmûna wî ya mirovahî û nirxên wî yên neteweyî, û gelek hunermendên kurd ji helbestên wî stran çêkirin mîna Saîd Gebarî, Beha Şêxo, Selah Resûl, Husên bavê Azad û Adil Heznî û yên din, yên ku bi dengên xwe nasnameya hunera kurdî vehûnandin. Helbestvanê nemir Hadî Behlewî têkiliyên wî yên germ bi gelek helbestvan, nivîskar û hunermendên mezin ên kurd re hebûn, wekî; Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Dilawar Zengî, Xelîl Sasonî, Seydayê Dilberîn û yên din, yên ku bi xebat û tîpên xwe yên bedew di çêkirina nasnameya wêjeya kurdî de beşdarbûne, di navbera wan de danûstandinên ramyarî û afirînerî hebûn ku pê ezmûna xwe dewlemend kir û asoya xwe ya çandî û edebî berfireh kir.

Wî dest bi jiyana xwe ya pîşeyî kir wekî mamoste li gundê xwe Girzîn bi dirêjahiya deh salan (1969–1979) . Piştî wê, ew çû bajarê Qamişlo û ji sala 1980’an heta 2004’an wek mamosteyê zimanê Erebî xebitî li dibistana Qadîsiyê ya jinan, bîst û çar salan ji xebata xwe ya bê rawestandin ji dayînê tevî derfet û jêhatîbûna wî û hewcedariya dibistanê bi karê wî, ew bi fermî nehatîye pejirandin, ev hemû ji ber sedemên nijadperestî û şovenîstî yên rejîma desthilatdariya wê demê, piştî wê jî, ew di nav 4 salan de (2004–2009) wekî mamosteyê zimanê Erebî li “Enstitûya Ruha” ya taybetî de xebitî. Wekî mamosteyê zimanê




Erebî di nav 40 salan de (1969–2009) xebitî, peyama perwerdehiyê bi dilsozî û dilpakî pêkanî, tevî hemû astengiyan, bi wê yekê tenê ne sekinî, mala felekê xirabe ew pêrgî ezmûnek pir zehmet anî, di sala 2010’an de, ew tûşî êşa Şekir bû û roj bi roj ew êş lê giran bû ta giha bînahiya herdû çavên wî winda bûn, ew bû hêsîrê hundirê malê, êş û nexweşiyê, lê tevlî weha jî tariya dîtinê nikaribû wî ji nivîsandin û wêjeyê dûr bixe, herwiha wî têkoşîna xwe berdewam kir û helbestên xwe bi ruhekî ku xwespartinê nas nake û serê xwe li ber bobelatên felekê naçimînê nivîsîn. Di dema kariyera xwe ya edebî de, wî sê berhevokên helbestî bi zimanê kurdî weşand, ku bûn şahidê pêdarî û dayîna wî :

1- Wê sibe bê - 2002
2-Ji Dil - 2017
3-Ristek Janên Hûnayî – 2021

Helbestvan Hadî Behlewî di sala 1972’an de bi xanim Heyhan Welîka re zewicî û pênc zarok ji wan re çêbûn( sê kur û du keç) wî di malbata xwe de penahgeh û piştgirîyek û hevalê rastîn di rêwîtiya jiyana xwe ya tije bi xebata edebî û perwerdehî dît.

Hadî Behlewî ne tenê helbestvan bû, lê her weha nivîskarek bû ku di demên dijwar û zehmet de barê çanda kurdî dabû ser milên xwe û beşdarî çalakiya çandî bibû, û roleke girîng lîst di belavkirina hişmendiya neteweyî de bi rêya gotar û lêkolînan di gel helbestên xwe, wî bal daye berhevkirina di navbera resenî û nûjeniyê de; wî di nivîsarên xwe de mîrasê kurdî zindî parast û di heman demê de pencereyek li ser nûjenîya edebî vekir.

Di her gotar an helbestê de, wî tovên nasname û xwecîbûnê di çand û di dilên xwendevanan de hesteke rûmet û nasname dilivand, wî di nivîsarên xwe de mijarên xakê, azadî, rûmet û qehremanî dianîn ziman, da ku helbest bibe dengê neteweyê û berxwedanek zindî li dijî bîrkirinê, wî mîrateyek dewlemend ji helbest, pexşan û gotarên ramyarî li pey xwe hişt ku bandor li nifşên nû yên helbestvan û nivîskaran kir, dengê wî pirek bû di navbera paşerojê û dema neha de, ku veguhestina çîrokên bapîran û nirxên fedekariyê dikir û wî şemala ziman û kelepûrê hildigirt da ku gotinên wî zindî bimînin di wijdana gel û rûpelên dîrokê de.

Di encama dayîna wî ya edebî û çandî de, wî gelek sipasname û xelat wergirtin, pîrozbahîya herî giring jî xelata Mela Ehmed Palo ya afirandinê bû di dewra duyemîn de sala 2014’an de, ji hêla Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê ve, rêzgirtin ji bo rêwîtiya wî ya taybet û beşdariya wî ya girîng di dewlemendkirina çanda kurdî de. Di sibeha 18’ê Tebaxa 2021’an de, wî jiyana xwe ji dest da li bajarê Qamişlo û laş wî yê pak bi merasîmekî girseyî bi beşdariya hêjmarek mezin ji milet, nivîskar û helbestvanan ji mizgefta Qasimo derxistin û bi aleya Kurdistanê rapêçayî ber bi gundê wî Girzînê ku dikeve başûrê Qamişlo ve birin û li wir oxirkirin. Hadî Behlewî bi laşê xwe koçkir, lê li pişt xwe mîratek edebî û çandî ya dewlemend hişt, ku dê bibe minareyek ji bo nifşên pêşerojê yên gelê Kurd, bi koçkirina wî, neteweya Kurd û helbesta Kurdî stûneke wêjeyî ya bilind wenda kirin, ew dê hertim di bîra gelê Kurd, nivîskarên wî, zanistvanên wî û her kesên ku ji zanîna wî vexwar, sax bimîne .Rûmet û mandarî ji giyanê wî yê pak re, û ji bo mîrateya wî ya edebî û çandî ya ku bûye milkê nifşan mayende û domdarî. Dibe ku laş di bêdengiyê de biçe, lê dengê wî yê helbestî hîn jî li cihê xwe dimîne, rêyan ronî dike û navê wî di bîra neteweya Kurd de xêzkirî dimîne wekî çiraxa ku qet venamir e.

# ‘Pêwîstiya dibistanên kampên Waşokanî û Serêkaniyê bi pêdiviyên sereke hene’

Berdevkê dibistanên kampên Waşokanî û Serêkaniyê Mihemed Haco diyar kir ku li her du kampan 6 dibistan hene û 6 hezar xwendekar di wan dibistanan de dixwînin. Herwiha Haco destnîşan kir ku pêwîstiya dibistanên her du kampan bi pêdiviyên sereke heye.

**Navenda Nûçeyan**

Dewleta Tirk a dagirker di 9’ê Cotmeha sala 2019’an de, êrişî bajarê Serêkaniyê û Girê Spî kir.
Di encama êrişan de bajarê Serêkaniyê Girê Spî hatin dagirkirin, ji ber êrişên çeteyan gelên wan bajaran koçberî herêmên biewle yên Rêveberiya Xweser bûn.
Herwiha ji bo bicihkirina van koçberan Rêveberiya Xweser kampên Waşokanî û Serêkaniyê ava kirin.
Di heman demê de, piştî dagirkirina Serêkaniyê qonaxa xwendinê hate rawestandin. Lê belê dema ku Kampa Serêkaniyê û Kampa Waşokanî hatin avakirin.
Li her du kampan 6 dibistanan hatin avakirin û pergala xwendinê di bin şert û mercên zehmet de careke din hate despêkirin. Hêjayî bibîrxistinê ye ku hejmara xwendekarên dibistanên her du kampan nêzî 6 hezarî ye.
Derbarê rewşa dibistanên Kampa Serêkaniyê û ya Waşokanî, berdevkê kampên Waşokanî û Serêkaniyê Mihmed Haco ji rojnameya me re axivî.

**‘Piştî dagirkirinê, perwerde bi zordarî hat despêkirin’**

Mihmed Haco anî ziman ku piştî dagirkirina Serêkaniyê, perwerde di bin şert û mercên zehmet de hat destpêkirin û wiha got: “Ji ber êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser bajarê Serêkaniyê tevahiyê gelên bajêr ziyan dîtin û bi taybet zarokan ziyan dîtin. Di heman demê de, qonaxa xwendinê hate rawestandin. Lê belê dema ku kampa Serêkaniyê û Waşokanî hatin avakirin, pergala xwendinê di bin şert û mercên giran de hate destpêkirin. Li her du kampan 6 dibistanan hene, di destpêkê d me li kamapa Waşokanî 3 dibistan ava kirin, du dibistanan ji bo xwendekarên seretayî ne û yek jî ji bo xwendekarên navîn û amedehî. Hejmara xwendekarên dibistanên her du kampan nêzî 6 hezarî ye. Herwiha ji sedî 25 xwendekarên kampê nayên dibistanê û ji xwendinê bêparin, ev xwendekar jî ji ber sedema rewşa madî ya malbatî nikarin werin dibistanê. Ev zarok ji bo rewşa xwe ya madî diçin kar, da ku debara jiyana malbata xwe bikin. Me çiqasî hewldanên xwe kirin ku van xwendekaran bi din xwendin, lê mixabin ev yek kêm ma.”

**‘Binesaziya dibistanên kampa Serêkaniyê û Waşokanî lawaz in’**

Haco diyar kir ku binesaziya dibistana lawaz in û wiha domand: “Astengî û zehmetiyên ku di dibistanan nava kampê de derdikevin, ew jî kêmbûna mamosteyan ne. Herwiha mamosteyên Kurdî yên beşên zanistî li dibistanên Kampa Waşokanî tune. Ji bo mijara mamosteyan me ji desteya perwedeyê re jî gotiye, lê belê heta niha li Kampa Waşokanî mamosteyên Kurdî tune ne. Di heman demê de, îsal pirtûk dereng man û di vê hevtiya pêşiya me de, em ê hewl bidin ku pirtûkan li tevahiya zarokên kampê belav bikin. Di aliyê nebûna kelûpelên xwendinê de jî astengî derdikevin, di Kampa Waşokanî de danîştekên xwendekaran kêm in û ev yek dibe sedem ku zarok li erdê rûnin. Niha pêwîstiya dibistanên kampa Serêkaniyê û Waşokanî bi sed danîştekên xwendekaran heye. Binesaziya dibistanên kampên Serêkaniyê û Waşokanî lawaz in, ji ber ku me di rewşeke lezgîn dibistanan li her du kampan ava kirin. Herwiha li dibistanên her du kampan elektirîk û av tune ye, helbet ev yek astengiyeke mezin bi xwe re tîne. Di heman demê de, rêxistin tenê ava vexwarinê ji bo zarokan peyda dikin. Lê pêwîstiya dibistanan bi avê heye, da ku her heft dibistanan werin paqijkirin.”

**‘Bi hatina zivistanê re gelek astengî derdikevin’**

Mihmed Haco anî ziman ku di her refekî de 50 xwendekar bi cih bûye û wiha got: “Pêwîstiya kampa Waşokanî û Serêkaniyê bi avakirina dibistanan heye, pêwîsteya xwendekarên dibistanên



kampa Serêkaniyê û Waşokanî bi pêdiviyên serek yên dibistanê heye. Gelek xwendekar bêkelûpelên dibistanê diçin dibistanê, helbet ev yek bandoreke mezin li xwendekaran dike. Bi hatina zivistanê re gelek astengî û zehmetî li pêş berî me derdikevin, ji ber ku dema baran dibare, derbasî nava dibistanan dibe. Di heman demê de, riya çûnûhatina dibistanan ji hev ketiye. Ji ber vê yekê dema ku baran dibare, em neçar dibin ku dibistanên kampê rawestînin. Tenê rêxistina Hêlp Kurdistan û Mala Kurdan di warê perwerde û avakirina dibistanê de destek dan me. Lê mixabin heta niha ji aliyê rêxistinên navdewletî ve tu alîkarî ji bo dibistanên Kampên Serêkaniyê û Waşokanî nehatiye pêşkêşkirin. Em bi hêvî ne ku rêxistinên navdewletî destekê bidin dibistanên Kampên Waşokanî û Serêkaniyê, ji ber ku pêwîstiya dibistanên her du kampan bi pêdiviyên sereke yên xwendinê hene.”

# ‘Şaredariya Qamişlo ji sedî 85 projeyên sala 2025’an pêk anîne’

**Diyala Nîdal\Qamişlo**

**Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo îsal projeyên berfireh pêk anîn û tevî zehmetiyan jî, ji sedî 85 projeyên xwe yên salê temam kiriye, herwiha projeyên netemamkirî li gorî planên wan didom in.**

Li Rojavayê Kurdistanê piştî Şoreşa 19’ê Tîrmehê, di dawiya meha Îlona sala 2012’an de, ji bo pêşkêşkirina xizmetguzariyê ji gel re, Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo hat avakirin. Şaredariyê roj bi roj kar û xebatên xwe berfirehtir kir û domand. Herwiha şaredariya bjarê Qamişlo jî weke hemû şaredariyên bajar û navçeyên din yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji bo parastina ekolojî û paqijiya bajêr, herwiha rewşa av, rê û kolanan, rojane kar û xebateke mezin dike. Şaredarî li gorî derfetên xwe pirojiyên xwe ji bo gel pêk tîne. Lewma di şaredariyê de gelek beş hene ku tê de têkiliyên gel bi komînan re jî tê kirin. Ji sedî 50 pirsgirêkên civakê di riya van têkiliyan tên çareserkirin.



**Şaredariyê ji sedî 80 projeyên xwe ya salane temam kirî ye**

Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo ji sedî 80’ê planên xwe ya salane temam kiriye û karê mayî li gorî bernameyan didome. Şaredariyê projeyê rê, av, paqijî û kenalên avqirêjiyê pêk anîn. Herwiha pêkanîna projeyan li gorî plana giştî ya salê pêk hat û piraniya xebatê di nav demên diyarkirî de temam bû. Lê projeyên mayî wê heta serê salê bi dawî bibin. Tevî zehmetiyan jî Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo piraniya planên xwe ya 2025’an pêkanîn, projeya bi rêjeya ji sedî 85 hatine pêkanîn. Zehmetiyên ku derketin ew jî têkildarî peydakirina alavan bû.

**Pirojeyên 2025**

Xebatên şaredariyê bi hevkariya saziyên Rêveberiya Xweser pêk tên, bi taybetî Desteya Şaredariyan, Rêveberiya Avê û Desteya Aborî, herwiha komîn jî hevkarên sereke yên projeyan in. Şaredariya Gel a li Qamîşlo, li Kantona Cezîrê, tevî zehmetiyên teknîkî û lojîstîkî yên ku tîmên kar pê re rû bi rû mane, beşa herî mezin a plana xwe ya salê ya 2025’an pêkanî.
Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo projeya kolandina bîrên avê temam kiriye. Herwiha ji sedî 75’ projeya tora elektrîka bîran jî pêk aniye, tîmên şaredariyê ji bo temamkirina wê xebata xwe didomînin. Di heman demê de, 465 cihên derbaskirina ava li kolanên sereke yên gelek taxan hatine çêkirin, ev xebat ji sedî 98’ temam bûye û hiştiye ku derbasbûna ava baranê hêsantir bibe û av li kolanan kom nebe. Ji sedî 90’ê xebata rastkirina rêyan bi kevirên şikandî li taxa Cirnikê jî temam bû ye. Di haman demê de şaredarî projeya xwe ya ziftkirina rêyên taxan didomîne. Lêçûna giştî ya vê projeyê milyonek û 622 hezar dolar e. Herwiha şaredariyê 4 wesayîtên nû ji bo paqijiyê peyda kirine, da ku kar û barên paqijiyê baştir bibin.Di heman demê li taxa Tey û kemberên Bakur û Rojhilatê bajar kampanyayên paqijkirinê bi rêk û pêk dewam dikin.

**Taxên ku ji hêla projeyan ve** hatine hewandin

Taxa Zeytûniye, Qidûrbek, Cûdî, Hêlîyê, Meyselûn, Helko, Cirnik, Kolana Dermanxaneya Dehham, Tey, hejmarek ji komînan, di nava projeyên 2025’an de hatin hewandin.

**Projeyên ku niha di bin pêkanînê de**

Dabînkirina elektrîkê ji bo bîran û ziftkirina hin bajaran ji sedî 75’ temam bûye, herwiha rêjeya ziftkirina riyan li navçeyan ji sedî 10’temam bûye.
Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo ji sedî 85` plana salane, tevî hin astengiyên lojîstîk, ber bi temamkirina projeyên mayî ve diçe.



## Yekê Mijdarê û Kurdistan

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Yekê Mijdarê Roja Cîhanê ya Kobanê ye. Pirsgirêka Kurdan bi sedan salan e berdewam dike. Ev pirsgirêk, tenê pirsgirêka dewletên herêmê nîne, berovajî wê; pirsgirêka Kurdan navdewletî ye.
Ji ber biryara perçekirina xaka pîroz, biryarekî navdewletî ye. Welatê me ji hêla dewletên cîhanê ve hatiye perçekirin û milletê me, bê statu hatiye hiştin.
Ji ber biryar navdewletî ye, tekoşîna Kurdistanê jî divê navneteweyî were meşandin.
Weke tê zanîn, milletê Kurd; gellekî qirkirin û ferman jiyîn e. Helepçe û Enfal hê zindî ye. Ruxmî van qirkirinên bi hijmar zêde jî, rihekî Kurdistanî ku bandora xwe li ser miletên cîhanê bike, derneket holê.
Mirov kare bi hêsanî bêje, Yekê Mijdarê pirsgirêka Kurd kir pirsgirêkekî navneteweyî.
Ger mirov li dîroka me vegere dê bibîne, cara yekem bi tekoşîna Kobanê, Kurd li hemû dinê hatin naskirin.
Tekoşerên Kurd yên bi çekên sivik li ber xwe didan û îradyekî ji pola li xwe pêçandibûn, ruxmê hemû êrîşên giran yên DAÎŞ û palpiştên wê jî di dawiyê de biser ketin.
Kobanê ruhek ava kir: bi sedan tekoşerên milletên dîtir yên cîhanê tevlî refên tekoşînê bûn û şehîd ketin. Ji çar hêlên cîhanê wijdan û raya giştî ya milletan rabû ser piyan. Raya giştî bandora xwe li ser politikaya dewletan kir. Vê bandorê hişt ku koalisyona navdewletî, dijî DAÎŞ ê bikeve nav liv û tevgerê. Her çû ev liv û tevgera navneteweyî zêdetir bû.
Hemû cîhan bi egîdî û qehremaniya keç û xortên Kurdan serbilind bû.
Kurdan di dîroka xwe de, cara yekem li cîhanê deng vedan. Di nava xwe de jî ji çar hêlên Kurdistanê keç û xortên me berê xwe dan qadên şer yên Rojava.
Ruxmê hemû perçebûn û belavbûna zîhnî jî, Kurdan careke din bi rihê Kobanê, yekitiya xwe ava kirin.
Bê pesindayîn mirov kare bêje; di dîroka Kurd û Kurdistanê de cara yekem, ev hêza yekitiya Kurd ya maddî û manewî derkete holê. Ger mirov dîroka Kurd û Kurdistanê pênase bike, li gor bîr û baweriya min, divê mirov bêje; berî berxwedana Kobanê û piştê berxwedanê.
Hemleya roja yekê Mijdarê ji bo Kobanê bû hemleya guhertina çarenûsa Kurdan.
Di dîroka her milletî de rojên pir giranbuha hene, bêguman yên Kurdan jî gelek rojên wan yên serbilindî û têkçûnan jî hene.
Lê di meşandina şerê Rojava de û bi taybet şerê Kobanê de, Kurd û Kurdistan bûn hêviyên mirovahiyê. Ger mirov bîne bîra xwe, hinekan destên xwe miz didan û digotin “Kobanî ber bi têkçûnê ye”. Xewin û xeyalên neyarên me, yên qirêj û tarî têkçûn. Berxwedana Kobanê her çû rihekî paqij û berxwedêr ava kir. Rihê yekê Mijdarê bû rihê azadî, hevgirtin, cesaret û serkeftinê. Ger milletê Kurd li derodora Kobanê ev ruh ava nekirana, wê neha gotina Kurd jî qedexe bûya. Gotinekî Kurd, heye: “ Ga bikeve erdê kêr lê zêde dibin”. Ger DAÎŞ têkneçûya, wê neha dewletên cîhanê DAÎŞ’î weke qehreman pêşwazî bikira.
Divê ev tiştên piştî radestkirina desthelata Surî tên jiyîn, dersên cîddî jê werin girtin. Cîhan pişta hêzên serkeftî digre, neko pişta rastiyan an ya mafdaran digre. Me bi deh hezaran cangorî dan û bi deh hezaran jî birîndar û gaziyên me hene. Divê milletê me ruhê yekê Mijdarê bilind bike, yekitiya xwe misoger bike û têkiliyên xwe ê navneteweyî bihêztir bike. Rihê Kobanê ew ê me bigîhîjîne lûtkeya berz ya azadiyê.



# Avabûna tevgera siyasî ya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê.... (1)

Tevgera Kurdî ya siyasî li Rojavayê Kurdistanê di bingeha xwe de ji rewşenbîrên Kurd hat avakirin, bi navê Xoybûn komeleyek ava bû, ji hişmendiya netewî û siyasî re bû bingeh, da ku yekem partiya Kurdî di sala 1957’an de were damezrandin û piştre parçe bibe. Tevgera siyasî ranewestiya, lê piştre gelek partî hatin avakirin.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Komeleya Xoybûn biingeha tevgera siyasî, rewşenbîrî, çapemenî ya Kurdî ava kir**


Tevgera Kurdî ya li Qamişlo û Lunanê di sala 1927’an de dest pê kir dema ku Komeleya Xoybûn li Lubnanê avabû.Komeleya Xoybûn komleyek rewşenbîrî ya netewî bû, li ser destê Celadet Bedirxan, Qedrî Can, Apê Osman Sebrî, Haco Axa û hwd… hat avakiri. Herwiha xebata wê li Beyrût, Şam û Qamişlo dihat meşandin. Da ku hişmendiya netewî û şoreş li dijî dagirkerên Rojavayê Kurdistanê li pêş bikeve, ev komele piştî têkbirina şoreşa Şêx Seîdê Pîran û îmzekirina Peymana Sayks-Pikot hat avakirin. Lê piştî zextên ku li ser komleyê hatin kirin û kêmderfetên aborî, di sala 1945’an de xebata wê rawestiya. Lê Komeleya Xoybûn bû xwedî muhreke dîrok di avabûna tevgera Kurdî ya siyasî li Rojavayê Kurdistanê, ji encama xebata wê jî şoreşeke siyasî, rewşenbîrî û çapemeniyê bi avabûna kovara Hewarê û avabûna yekem partiya Kurdî pêk hat.

**Destpêka tevgera siyasî û avabûna yekm partiya Kurdî**

Yekem partiya Kurdî ya ku li Rojavayê Kurdistanê ava bû, di sala 1957’an de bû, dema ku Osman Sebrî, Ebdilhemîd Hecî Derwîş, Reşîd Hemo, Hemza Mele Niwêran, Mihemed Elî Xoca û hwd… ji siyasetmedarên Kurd partiyek bi navê Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya(Partî) ava kirin. Civîna avakirinê jî di 14’ê Pûşbera 1957’an de bi piştgiriya Mam Celal Telebanî hat lidarxistin. Piştî avabûna partiyê û rêxistinkirina wê li Rojava, damezirînerên wê, xwestin siyasetmedarê Kurd Nûredîn Zaza serkêşiya PDKS(Partî) bike. Nûredîn Zaza demek xwest û merc li PDKS’ê kir da ku bi axa û begên Rojava re yekîtiyekê ava bike û jê re bibin piştgir. Piştî salekê erê kir da ku bibe serokê PDKS’ê(Partî) û Apê Osman Sebrî jî bû serkretêrê wê. Lewma bi armanca rizgarkirin û yekbûyîna xaka Kurdistanê, hem jî li dijî dagirkirin û paşverûtiyê, herwiha têkoşîna ji bo demokratiyê xebat dan meşandin. Xebata wan jî di çarçoveya xwegihandina mafê netewî, ji ber vê yekê jî daxwaza bidestxistina mafê jinan, xwendina bi zimanê Kurdî, avakirina dibistan sazî komeleyên rewşenbîrî û civakî yên Kurdî, hat kirin. Di 12’ê Tebaxa sala 1960’î de desthilata Sûriyê ya wê demê piraniya damezirînerên PDKS’ê(Partî) desteserkirin û îşkencekirin. Osman Sebrî, Reşîd Hemo, Nûredîn Zaza, Mihemed Mele Ehmed ji wan kesên ku hatin desteserkirin. Di zindanê de çîroka parçebûnê û nerînên cuda derketin, bi taybet di navbera Osman Sebrî û Nûredîn Zaza de. Dijberî û parçebûn ji ber bername û armancên partiyê de bû. Wekî tê zanîn rêjîma Sûriyê zext li ser wan dan meşandin, da ku armancên vê partiyê û xebata wê nas bike. Li aliyekî Nûredîn Zaza dixwest armancên partiyê veşêre û bi rêbazekî xwe ji pêşengtiya partiyê û daxwazên netewî yên Kurdî bide paş. Lê Osman Sebrî armancê partiyê û daxwazên netewa Kurd dan pêşiya her tiştî. Lewma du nerîn derketin holê, paşê ev nêrîn bûn pirsgirêk di navbera her du aliyan, bê guman hewldanên rêjîma Sûriyê ji bo parçekirinê jî di warê cudakirina nerînên siyasî yên Kudî de hebûn, lê faktora ku bû sedema cudabûna nerîna siyasî ya Sûriyê jî, cudabûna partiyên Başûrê Kurdistanê bû.

**Yekem partiya Kurdî û parçebûna wê**

Di sala 1965’an de parçebûn di PDKS(Partî) de çêbû, aliyek jê bi serkêşiya Osman Sebrî bi ramanê çepgiriyê û aliyê din bi serdariya Nûredîn Zaza bi parçeyê rastgiriyê. Parçebûn ji ber berjewendiyên takekesî cuda hat



encamdan, ji ber PDK a Başûrê Kurdistanê bû du parçe, bandora vê parçebûnê li PDKS(Partî) kir. Ruxmî parçebûn hebû di navbera her du aliyan de, lê diyalog û lihevkirinek di gelek waran de ji bo mijarên netewî dihat domandin. Ev yek jî heta sala 1970’ê pêk hat, wê demê her du alî li gel hin kesayetên serbixwe hatin vexwendin bo Başûrê Kurdistanê. Li Başûrê Kurdistanê û kongreya niştîmanî ya ku li Başûr li dark et, hewldaneke niştîmanî bû ji bo yekbûna her du aliyên PDKS(Partî) bû. Her du alî bi rengekî ji rengên yekbûnê nêzî hev bûn û siyasetmedarê Kurd Deham Mîro bû sekretêrê partiyê. Ev yekbûn tenê salekê dewam kir piştre bûn sê partî, ya çep bi serokatiya Osman Sebrî, ya rast bi serokatiya Nûredîn Zaza û ya din weke partiyeke bêalî bi serokatiya Deham Mîro ava bû. Piştî wê di sala 1975’an de parçebûn kete partiya çep û partiya serek ya ku hat yekkirin piştî gongreyê niştîmanî, da ku hejmara partiyan bibe 5 partiyên Kurdî.

**Di navbera salên 80 heya 90’î de tevgera siyasî ya Kurdî**

Di nava avakirin û parçebûna partiyên Kurdî de, Tevgera Rizgariya Kurdistanê gavên xwe yên destpêkê davêtin Rojava. Bi taybet dema ku Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan di sala 1979’an de derbasî Kobanê bû, piştî wê tevgerke siyasî û rêxistinî ji bo doza Kurdî li Rojavayê Kurdistanê da sazkirin bêyî ku partiyekê ava bike. Ji destpêka derbasbûna Rêber Apo heya dawiya salên 1990’î jî xebata Siyasî li Rojava û Sûriyê bi rengekî veşartî dihat kirin.
Di sala 1981’ê ji parçebûnên PDKS (Partî) parçebûneke din çêbû, Mihiyedîn Şêx Alî partiyek bi nave Partiya Karkerên Demokrat a Kurdî li Sûriyê ava bû. Piştî wê partiyeke din ji şaxê PDKS’ê bi navê Partî ji hêla Ismaîl Umer ve di sala 1988’an de ava bû. Di heman demê de sala 1998’an ji PDKS’ê (Partî) du pask çêbûn, yek bi serokatiya Neserdîn Ibrahîm ya din bi serokatiya Nezîr Mustefa. Di heman salê de Ebdilrehman Alûcî Partî Dîmukuratî Kurdî ya Sûriya da avakirin. Di sala 1982’an de partiyeke bi navê Pariya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê ji hêla Ebdilhemîd Hecî Derwîş ve hate dameziran-din û ew jî 3 caran hate paçekirin. Partiya Çep a Kurd li Sûriyê jî baskeke ji PDKS’ê(Partî) ye di sala 1965’an de hatiye avakrin, di destpêka salên 80’î de Partiya Karkerên Kurd li Sûriyê bi du aliyan bi serkêşiya Sebxetullah Hêzanî hat dameziranin, di sala 1990’î de aliyek jê bi serokatiya Mihemedê Mûsê û aliyek jê bi serkêşiya Xêredîn Murad hat damezirandin. Piştre Partiya Karkerên Kurd li Sûriyê di salên 90’î de tevlî partiya Yekîtî bû. Partiya Yekîtiya Gel a Kurd li Sûriyê di 1980’î de bi riya Fiûad Elîko, Hesen Salih, Seidedîn Mele û Ebdilbaqî Yûsif hat damezirandin, herwiha di sala 1990’î de, van kesayetan partî fesix kirin û bi heman navî partiyeke din çêkirin û piştî wê, ev partî tevlî Partiya Yekîtî ya Demokratî ya Kurdî kirin. Di sala 1981’ê de Partiya Karkerên Demokrat ya Kurd li Sûriyê hat avakirin, ew tevlî şaxê Partî yê Ismaîl Umer bû da ku Partiya Demokrata Kurdiya Yekbûyî ava bikin. Di sala 1993’an de jî Partiya Yekîtiya Demokrat ya Kurd li Sûriya(Yekîtî) hat avakirin, ew ji yekbûna Partiya Karkerên Demokratîk, şaxê Partî ya Ismaîl Umer, Partiya Yekîtiya Gel a Kurd, Partiya Karkerên Kurd û kokek ji partiyên ku ji Partiya Çep ya Kurd parçe bûbûn hat damezrandin.Ev partî jî du caran di slalên 1997-1998 û 2000’an hate parçekirin, Di heman demê de di salên pêşîn 1990’î de Partiya Komînîst a Kurd li Sûriyê hat avakirin, ew jî du caran piştî sala 2000’î parçe bû. Bê guman rewşa piraniya van partiyan weke xwe nema, guhertin çêbû. Di heman demê de rewşa siyasî li Rojavayê Kurdistanê kete qonaxeke din de.

# ‘Pêwîst e sîstema navendî û qirkirin bi dawî bibe’

**Hevserokê Ofîsa Giştî ya Têkiliyên Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Silêman Ereb diyar kir ku pêwîst e hikumeta veguhêz a Sûriyê li gel guhdar bike û got, “Beriya her tiştî pêwîst e peymana 10`ê Adarê bikeve piratîkê de û hikumeta veguhêz gavên erênî biavêje ku hemû pêkhate cihê xwe di rêvebirina Sûriyê de bigrin."**

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Piştî 13 salan ji kirîza Sûriyê sîstema netewperest a rejîma Baasê hat hilweşandin. Bêguman hikumeta veguhêz a Sûriyê hat avakirin, li gorî biryarên wê, tê xuyakirin ku Sûriye ber bi sîstemek olperest ve diçe. Di heman demê de ku heya roja îro hikumeta veguhêz a Sûriyê dixwaze biryarên yekol, yekreng û yek diruşma li ser gelê Sûriyê bide meşandin. Di heman demê de gef, êriş, koçberî, kuştin û revandin berdewam e. Ev yek dibe sedem ku rewşa Sûriyê ber bi aloziyên mezintir re ve biçe.

Di vê çarçoveyê de Hevserokê Ofîsa Giştî ya Têkilyên Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Silêman Ereb ji Rojnameya me re axivî.

**‘Heya ku mafê pêkhateyan Sûriyê neyê dayin wê aştî û aramî xewn be’**

Silêman Ereb di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser kiryar û sûcên hikumeta veguhêz a Sûriyê li ser gelê Sûrî û wiha got: “Wek tê zanîn ku di 8’ê Berfanbara 2024’an de rêjîma Bass hat hilwşandin, herwiha li şûna wê hikumeta veguhêz ya Sûriyê hat li ser desthilatdariyê, lê mixabin heya roja îro tu guhertin û veguhertinên erênî nehatine çêkirin, ev desthiletdarî jî xwe bi xwe hilbijartinên xwe dan çêkirin û kesên li gor fikr û tevgera wan hatin hilbijartin, ji bo rêvebirina Sûriyê. Lê ev rewşa Sûriyê her ku diçe aloztir dibe. Ew zehniyeta yekol, yekreng û yekdiruşme li ser gelê Sûriyê feriz dike û dixwaze gel hemû bi hişmendiya xwe ve bide fetsandin, ji ber vê yekê ev kiryar bûn sedem ku gelên Sûriyê nerazîbûna xwe nîşan bide, ji ber ku her pêkhateyek xwedî ol, çand û kevneşopiyeke resen e, ev wê neyê qebûlkirin. Lê hikumeta veguhêz ji bo hin biryarên xwe yê çewt bide ferizkirin, xwest ku bi rêya komkujiyan, kuştin, talankirin, revandina jinan û tundiyê, çavê gel bide şikandin. Lê dîsa jî negihîşte armanca xwe ku heya roja îro mafê tevahî pêkhateyên Sûriyê dixwe û wan qebûl nake. Li Sûriyê heya niha şer, kirîz û pevçûn dewam dikin, heta ev yek jî gef li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêdike. Ji van kiryar û sûcan zêdetir pêwîst e hikumeta veguhêz ya li gel guhdar bike, di heman demê de ku kongreyeke niştîmanî li dar bixe û hemû pêkhate di nav de cih bigirin ku guhertinên destûrî bide çêkirin. Heya ku mafê hemû pêkhateyan neyê dayin, wê aştî û aramî xewna Sûriyê be.”


**‘Pêwîst e ji bo Sûriya nû destûreke demokratîk were nivîsandin’**

Silêman di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku dive bawerî û mafê hemû pêkhateyan were dayin û wiha domand: “Pêwîst e ji bo Sûriya nû destûreke demokratîk were nivîsandin ku mafê hemî pêkhateyan têde hebe. Herwiha niha Sûriyê di qonaxekî veguhêz de ye û ev pêvajo ango qonaxa veguhêz pir girîng e, eger ev kiryar û sûcên hikumeta veguhêz bi vê rengî dewam bike, helbet wê baweriya gel bi hikumetekî bi vî rengî neyê. Di serî de pêwîst e koçberên Serêkaniyê, Efrîn û Girê Spî vegerin mal û milkê xwe ku jiyana wan li malên wan bi awayekî ewle be. Xala herî girîng jî ew e ku mafê jinan neyê windakirin, ji ber ku jin bingeha jiyan û civakê ne, eger maf û keda wê were çewsandin, wê demê jiyana civakê wê were windakirin. Ji bo gavavêtina Sûriyayeke demokratîk di destpêkê de divê hikumeta veguhêz jinan di hundirê rêvebirina Sûriyê de qebûl bike. Ji ber ku jin ne jinên berê ne ku serî ji dewletên hegemon re bitewînin, jinên îro bi hêz û îradeyekî pir xurt serî radikin.”



**‘Pêwîste sîstema navendî û qirkirinê bidawî bibe’**

Hevserokê Ofîsa Giştî ya têkilyên Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Silêman Ereb di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman: “Beriya her tiştî pêwîst e peymana 10`ê Adarê bikeve piratîkê de ku hikumeta veguhêz gavên erênî bavêje, di heman demê de ev deng û biryarên ku ji hikumeta veguhêz dedikevin pêwîst e geêli dijî wê nerazîbûn û tekoşînê nçşan bide. Pêwîst e kuştin, talankirin, êrişkirin, şerê taybet û yê ragihandinê werin rawistandin. Divê di avabûna Sûriyeke nû de azadî, wekhevî û qebûlkirina jinê esas be û pêwîste ku sîstema navendî û qirkirinê bidawî bibe. Di heman wextî de sîstema demokrasî û azadiyê were avakirin.”



## Şoreş û Rojava

**Sînan Cûdî**

Sedsalek berê, Şoreşa Cotmehê sozek mezin da gelên cîhanê: mirov dikarin çarenûsa xwe bi xwe dîyar bikin. Ev soz di seranserê sedsalê de bû hêviyek ku bi mîlyonan kesan hilgirtin. Lê her şoreşek ku ket destê dewletê di dawiyê de gelê xwe jî li derve hişt. Wekî ku li Yekîtiya Sovyetê, Çîn û Ewropaya Rojhilat hat dîtin, şoreş êdî ne hêza gel bi xwe bûn û veguherî pergalek desthilatdariyê ya burokratîk. Ev tam cihê krîza ku çepgir, şoreşger û welatparêz îro pê re rû bi rû ye ye: Şoreş, desthilatdarî ye, an jî ji nû ve avakirina civakê ye?
Kevneşopiya sosyalîst a sedsalî dewletê wekî dijmin an jî wekî amûrek didît. Hinekan digotin ku divê ew were hilweşandin, yên din jî digotin ku desteserkirina wê ji bo şoreşê girîng e. Lê her du rê jî ber bi heman armancê ve diçûn: Dewlet. Lê şoreşa rastîn ewê ku dewletê bibihure an derbasbike. Ji ber dewlet tu car nabê ya gel û civakan. Li van axan, gel rêyek nû di navbera "bêdewletbûnê" û "bûyîna dewlet" de dîtiye. Komun, meclîs, kooperatîf, rêxistinên jinan, meclîsên ciwanan... Ev ne alternatîf in; ewxweparastina civakê bi xwe ne, rêveberiya wê bi xwe ne. Li Rojava, siyaset careke din di jiyana rojane ya gelan de xwedîyê xwe dîtiye; êdî tu hêzek li derveyî gel tune ye. Di vê wateyê de Rojava, careke din şoreş xistiye destê gel. Li vir, şoreş ne bîranînek dîrokî ye ku her sal tê bibîranîn e. Di nav şer û ambargoyê de, gel fêr bû ku jiyana xwe, saziyên xwe û parastina xwe birêxistin bike. Şoreş ne tenê bûye şêweyek rêveberiyê, di heman demê de bûye ramanek. Bi gotinekî din, gelê Kurd, karên ku ji ber Şoreşa Cotmehê neqediyaye temam dike. Li şûna ku dewletê bigire, ew rêxistinkirina civakê dide pêşiyê. Gel rasterast çarenûsa xwe diyar dike. Dewlet bi rêxistina gel ve tê guhertin; siyaset careke din bi civakê ve tê girêdan.
Bêguman tiştê ku Şoreşa Rojava bêhempa dike ne tenê ev şêweya rêxistinê ye, lê di heman demê de mijara guherbar a şoreşê ye jî. Ji bo cara yekem di dîrokê de, jin wekî hilgir û damezrînerên şoreşekê li ser dikê ne. Gundên jinan ên wekî Jinwar, akademiyên jinan, berxwedana YPJ…Ev ne tenê sazî ne; ew exlaqek civakî ya nû temsîl dikin ku li dijî sedsalan serdestiya mêran hatiye damezrandin. Li Rojava, fikra azadiyê bi hev re bi jinan, xwezayê û civakê re tê fikirîn.
Ev şoreşek e ku ji têgihîştina sosyalîst a klasîk derbas dibe.Hin derdor hîn jî Rojava wekî "ceribandinek bêdewlet" piçûk dibînin.Lêbelê, tiştê ku li vir tê damezrandin ne têne bêdewletbûn e, lê ji nû ve avakirina civakîbûnê ye. Nêzîkatiya ku em jê re dibêjin moderrnîteya demokratîk bi rastî vê yekê vedibêje: Siyasetek ku ji dewletê derbas dibe lê civakê terk nake. Li dijî moderrnîteya kapîtalîst a li ser bingeha dewleta neteweyî, pîşesazî û sermayeyê modelek civakî ya ku li ser azadiya jinan, jiyana ekolojîk û aboriya komunal disekine.
Ev şêweya nû ya sosyalîzma sedsala 21’an e. Wateya Rojava ne tenê xwerêvebirina gel e, lê ji nû ve vejîna fikra şoreşê ye jî. Li vir, şoreş êdî desteserkirina desthilatdariyê nîne, lê rakirina desthilatdariyê ji civakê ye.
Ji ber vê yekê, Rojava ne "projeyek desthilatdariyê" ye, lê projeyek jiyanê ye. Heta di şer de jî, hevgirtina gel, berdewamiya komunan û serokatiya jinan vê yekê nîşan didin. Şoreşa Cotmehê nîşan da ku şoreş mimkun e. Lêbelê, Şoreşa Rojava nîşan dide ka şoreş çawa dikare were jiyîn. Ya yekem dîrok guherand, ya duyemîn jî niha diguherîne. Û belkî ev gotina herî şoreşger a serdema me ye: Rojava nîşan dide ku şoreş hîn jî zindî ye.

# Nifira dayikan!

**Volqan Elî**

Piştî ku pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk dest pê kir, Komisyona Meclisê karîbû bi derengmayinê encax di serê Tebaxa vê salê (1925) de bihata avakirin. Ya rast ev Komisyona li Meclisa Tirkiyê hatiye avakirin jî, pêşniyara Rêber Apo bû. Tevî kêmasiyan, mirov dikare bêje bi destpêkirina pêvajoyê re yekane gava erênî ku dewleta Tirk avêtiye jî ev e. Di çarçoveya xebata xwe de gelek çalakî meşandine, gelekî xwe û mêvanên xwe westandine. Lê belê karê xwe yê malê yê herî girîng ji bîr kiriye, yan jî herî kêm heya bi niha nexwestiye pêk bîne: Li gel Rêber Apo, ku sermizekerevanê aliyê gelê Kurd e, nîqaş nekiriye. Dîsa jî ji ber ku hê ev pêvajo neqediyaye, bi giştî eger niyeta dewleta Tirk ji bo aştî û xwîşk û biratiyê hebe, ev Komisyon dikare vê kêmasiya xwe derbas bike. Yanî bûyerên balkêş û sosret bi vê sînordar nemane. Di rojeke kelagerma îsal de bûyerek qewimî ku her kes ma heyirî! Bi rastî li gorî gelê Kurd qe jî ne ecêb bû. Lewra gelê me reftarî û tevgerên dagirkeriya Tirk baş nas dikir. Dema ku rewşa wê zeyif û lewaz bûya, wekî Tayyipê ber lingê Trump, heya tu bêjî stuxwar bû. Lê piştî ku keysa xwe lê dianî, dikarî di lahzayekê de wekî çêleka zer pahnekê li şîrê xwe bixe, her tiştî gemarî bike.

Ez ne şaş bim, Komisyona me ya tê zanîn dîsa li ser karê xwe bû. Vê carê mêvanên wan Dayikên Aştiyê bûn. Cih, Meclisa Tirkiyê bû. Dor dora dayikên me bû. Ji ber ku herî kêm li gorî sê olên semawî û piraniya olan, Xweda ew Kurd afirandibû, dewleta Tirk jî nekaribû ku zimanê Kurdî pê bide jibîrkirin, dayika me dest pê kir bi zimanê dayika xwe, yanî bi Kurdî biafe! Ji ber ku Numan Kurtulmuş hem serokê Meclisê û hem jî serokê Komisyona li meclisê hatiye avakirin bû, hema di cih de, ne got ‘ez Misilman im û li jorî min Xweda heye’, axaftina Dayika Aştiyê da qutkirin! Negot, “ev Kurdiya ku ev dayik pê diaxife û ev dayik bi xwe, ji aliyê Xwedayê min ve hatiye afirandin. Ma ez ê çawa li ber Xwedayê xwe rabim û zimanê ku Wî afirandiye qedexe bikim”. Di encamê de kir, wekî Xwedayê xwe înkar (haşa!) bike... Na, bûyerên sosret û balkêş bi vê jî sînordar neman! Her kesê çîrokên Osmanî bihîstî, hinekê dewleta Tirk nas dike, dizane ku padîşahên kalikên wan ji bo selameta dewleta alî ya Osmanî kuştina bira û malbata xwe helal kirine. Ma li ber vê, gotina çand û zimanê gelekî wekî Kurdan bindest bûyî çi qiymeta xwe heye (!) Yanî li gorî fitrata dewleta Tirk ev hemû jî tiştên ji rêzê ne, dibin. Na, ev gotin yan jî encam ne fikrên me ne! Ew bi xwe wisa dibêjin! “Dema ku bekaaya (pêşeroj-çarenûs) dewletê dibe mijara gotinê, her tişt (ev dibe ku ziman, çand, gel û civakek din be yan jî xwîşk û birayên wan bi xwe bin) hûrguliyek e.” Biçe ji Bahçeli yan jî Erdoğan bipirse ew ê bêje “tu rast dibêjî, wisa ye”. Lewra ez dibêjim divê mirov tiştên wisa, ji bo wan ji rêzê bibîne! Lê hin tişt hene ku ti kes nikare ne înkar bike, ne ji rêzê bibîne û ne jî binpê bike! Dema em dibêjim nikare’ tam ne wisa ye! Ya ku dike, dike! Lê neheqî û bêwijdaniya ku kiriye, bi nifirek ku hatiye kirin berevajî li yê/ya ku we neheqî kiriye dizivre! Dibe ku ev nifir ji aliyê dayika wî/wê ve hatibe kirin!

Em niha hatin li ser bûyera herî ecêb û sosret! Numan Kurtulmuşê serokê Meclisa Tirkiyê bi navê xwe yê serokê Komisyona Meclisê çend rojan ji beriya vê (16 yan jî 17’ê Cotmehê), çend endamên meclisê jî girtibûn gel xwe û çûbû seredana Amedê! Di vê gerûgeştê de, gelo armanca wî ew bû ku şaşitiya li hemberê Dayika Aştiyê kiriye sererast bike? Bi guman e. Gelek gotin kirin lê hevoka wî ya herî balkêş û sosret ev bû: “zimanê mirov wekî şîrê dayikê helal e.” Em ti şîrove yan jî nirxandinê li ser gotina wî nakin. Tenê em ê tehmîneke xwe bêjin. Bi îhtimalekî mezin dayika Numan Kurtulmuş lê duayek û nifirek kiriye û wisa gotiye: “here kurê min eger ti li ser riya heq bimeşî bila şîrê min li te helal be; eger na, tu yê wijdanê xwe bidî bin lingên xwe û bimeşî, şîrê berê min ku te mêhtî bila li te bibe nizanim şîrê çi tiştê!”. Em nikarin bibin kefîlê dayika wî, da bizanibin wê, derbarê kurê xwe yê Numan de çi fikiriye. Lê em dizanin ku kî dibe bila bibe, ti dayik naxwazin kur û keçên wan bêwijdanî bikin û bidin li ser riya neheq! Xuye ye nifira diya wî (Numan Kurtulmuş) xwe lê daye der …



# ‘Armanca hikumeta veguhêz a Sûriyê pareçekirina Sûriyê ye’

**Endamê Rêveberiya Kongreya Islama Demokratîk Ebdulkerîm Saroxan diyar kir ku ji dema hatina hikumeta veguhêz a Sûriyê ser desthildariyê kiryarên wê li dijî gel ranewestiyan ne û got, “Armanca hikumeta veguhêz a Sûriyê parçekirina Sûriyê ye."**

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Piştî ketina rêjîma Baas bi hevkariyên hêzên navdewletî hikumeta veguhêz a Sûriyê an jî HTŞ’ê hate li ser desthildariya Sûriyê. Di heman demê de, hêvî, xewin û xeyala gelê Sûriyê ew bû ku piştî ketina rêjîma Baas Sûriyeke demokratîk, wekhev û pirrengî were avakirin. Ji bo vê yekê tevahiya gelê Sûriyê kêfxweşiya xwe da xuyakirin,lê piştî ketina rêjîma Baas û hatina hikumeta veguhêz a Sûriyê ew hêvî, xewin û xeyalên lê Sûriyê hatin şikandin. Ji ber ku ev hikumet bi hişmediyeke yek rengî û yek alî desthildariya Sûriyê birêve dibe. Herwiha gelek hewldanên xwe dike ku vê hişmendiya xwe li ser gelê Sûriyê feriz bike.

Di derbarê mijarê de, Endamê Rêveberiya Kongreya Islama Demokratîk Ebdulkerîm Saroxan ji Rojnameya me re axivî.

**‘Hikumeta veghêz a Sûriyê hikumeteke şiklî ye’**

Ebdulkerîm Saroxan da zanîn ku ji dema ku hikumeta veguhêz a Sûriyê hetiye li ser desthildariyê kiryarên wê yên li dijî gel ranewestiya ne û wiha got: “Hikumeta veguhêz a Sûriyê bi hevkariya hêzên hegemonîk di bin navê hikumeta demkî de hate li ser desthildariya Sûriyê. Di heman demê de, hikumeta veguuhêz a Sûriyê ne bi têkoşîn û şoreşê re hate li ser deshildariya Sûriyê. Rengê vê hikumeta veguhêz a Sûriyê şikilî ye, ev hikumet bi xwe komên çeteyan ne, lê piştî hatin li ser deshildariyê navên xwe guhertin. Lê di aliyê cewher de tu guhertin çênekirine, ew hişmendî û siyasete.

Gelên Sûriyê ev 14 salan di nava şer û aloziyan de jiyan dikin, herwiha gel bi gelek komkujiyan re derbas bû. Lê xewin û hêviya tevahiya gelê Sûriyê ew ku bi hatina hikumeta veguhêz a Sûriyê re wê guhertin çêbibin û Sûriyeke demokratîk û wekhev were ava kirin. Lê em dibînin ku ji dema hikumeta veguhêz a Sûriyê hatiye li ser deshildariyê kiryarên wê yên bê exlaqî ne hatin rawestandin. Hişmendiya vê hikumetê hişmendiya tolhildanê bû, li ser vî bingehî gelek komkujî li dijî civaka elewî û durizî pêk anîn. Hikumeta veguhêz a Sûriyê dixwaze ku desthildariya xwe li ser gel feriz bike, lê belê desthidariya bi vî rengî nayê ferizkirin.”

**‘Hikumeta veguhêz tevliheviyê di nava pêkhateyan de derdixe’**

Saroxan anî ziman ku hikumeta veguhêz a Sûriyê li ser nasnameyê gelên Sûriyê dikuje û wiha pê de çû: “Me dît ku hikumeta veguhêz gelê berava Sûriyê dûrî yekrêziya Sûriyê kir. Piştre kongereke niştîmanî lidarxistin û di wê kongriyê de nûnerên civaka Sûrî nehatin vexwendin, mîna nûnerên Kurd, Aşûr, Suryan, Kildan, eşîrên Sûrî û hwd.. Di heman demê de hikumeta veguhêz ev pêkhate paşguhkirin. Herwiha Hêza Sûriya Demokratîk QSD’ê ku temsîla tevahiya gelên Sûriyê dike, ji kongrê niştîmanî yê hikumeta veguhêz a Sûriyê de nehate vexwendin. Di vî kongrê hikumeta veguhêz de tenê nûnrên wan amede bûn, ji ber vê yekê ev kongr ne bû kongerek ji bo pêşeroja Sûriyê.

Hikumeta veguhêz a Sûriyê weke sîstema rêjîma Baas mafê hemû pêkhateyên Sûriyê di destûrê de paşguh dike, qaşo ku bihare gelan û şoreşeke hatiye çêkirin. Wê demê tê xuyakirin ku hikumeta veguhêz a Sûriyê ne bi navê şoreşekê ye. Ev kiryarên ku ji aliyê hikumeta veguhêz ve hatin kirin bi xwe xirabûnek ji bo Sûriyê bi xwe re anîn. Civaka Sûriyê ya hevgirtî ji hev parçekirin, ne hiştin ku girêdana wan bi hev re bimîne. Gelek hewldanên xwe kirin ku reşkirinê di navbera pêkhateyên Kurd û ereban de derxin. Lê berovajî vê yekê ew hewldanên wan ne çûn serî.”

**‘Hikumeta veguhêz a Sûriyê berê Sûriyê dide parçebûn’**

Ebdulkerîm Saroxan eşker kir ku di Şamê de tu desthildara demkî bi rengekî sîstematîk wê bi rêve bibe tu ne ye û wiha berdewam kir: “Ev hikumeta niha li Şamê komên çeteyan e, gelek ji wan çeteyan jî biyanî ne û destê wan di xwîna gelên Sûriyê de heye. Ev çeteyên bi vî rengî di nava rêveberiya Şamê de bi tu awayî wê nikarbin Sûriyê bi rêvebibin. Ji ber vê yekê pêwîst e ku ev çeteyên ku destê wan di xwîna gelê Sûriyê de heye di asta navdewletî de werin cezakirin. Ji dema ku hikumeta veguhêz a Sûriyê hatiya li ser desthildariyê Sûrî di nava aloziyan de rû bi rû ye. Herwiha tu guhertin li ser rûyê erdê ne da avakirin. Ev hikumet ne bixwsteka xwe tevdigera, lê belê bixwseke dewleta Tirk a dagirker tevdiger. Armanca hikumeta veguhêz a Sûryê parçekirina Sûriyê, ev hikumet berê Sûriyê dide parçebûn.”



Ebdulkerîm Saroxan axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Pêwîst e gelê Sûriyê li xwe vegere û yekrêziya xwe xurt bike. Di nava hemû pêkhateyên herêmê de pêwîst e diyalok werin çêkirin, bi hev re hîn zêde tir asta têkoşîn û berxwedaniyê xurt bikin. Da ku Sûriyeke demokartîk, azad û wekhev were ava kirin.”

# ‘ANF’ê dengê heqîqetê ye’

**Navenda Nûçeyan**

**Nûçegihana ANF’ê Roj Denîz diyar kir ku Ajansa Nûçeyan a Firatê ANF’ê di 26’ê Cotmeha 2005’an de bi armanca ragihandina rastiya gelê Kurd û Kurdistanê ji bo cîhanê, hate avakirin û got, “ANF’ê ragihandina dengê gelê Kurd û Kurdistanê ye.”**

Ajansa Nûçeyan a Firatê ANF’ê di 26’ê Cotmeha 2005’an de li Ewropayê hate avakirin. Navenda sereke ya Ajansê li Belçîkayê ye û nûçegihanên wê li cîhanê belav bûne. Ajans bi 8 zimanan weşanê dike û li ser asta cîhanî kar û xebatên xwe dide meşandin, lê bi xwe ew Kurdistanî ye. ANF’ê di dîroka ragihandina Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jî bi kûrahî cihê xwe girtî ye.

Derbarê salvegera 20’an a damezrandina Ajansa Nûçeyan a Firatê ANF’ê, nûçegihana Ajansa ANF’ê Roj Denîz ji Rojnameya me re axivî.



**‘ANF’ê cîhanî ye’**

Roj Denîz anî ziman ku Ajansa Nûçeyan a Firatê ANF’ê li ser asta cîhanî xebatê dide meşandin, lê ew Kurdistanî ye û wiha got: “Ajansa Nûçeyan a Firatê ANF’ê di sala 2005’an de bi armanca ragihandina rastiya gelê Kurd û Kurdistanê ji bo cîhanê, hem jî derxistina êş û berxwend wan, êşkerekirina sîstem û işkenceyên ku li ser wan tê meşandin, hate avakirin. Di heman demê de em rastiya çi gelê ku rastî işkence û zordariyan tên, ji raya giştî re radigihînin. Em bi pênûs, kamîre, nûçe û dosyanan rêhevalên civaka xwe ne ku em her tim daxwaz, êş, zehmetî û berxwedaniya gelê xwe ji cîhanê re radigihînin. Bi taybetî daxwazên jinan û berxwedaniya wan a ku li her çar parçeyên Kurdistanê tên meşandin, derdixînin pêş. Ji wê zêdetir li gelek welatan jin bi serhildanan radibin, ji bo vê yekê weke erkî sereke ye ku em van geşedanên ku jin pê radibin bidin pêş.”

**‘ANF’ê dengê heqîqetê ye’**

Roj Denîz da zanîn ku Ajansa Nûçeyan a Firatê dengê heqîqetê ye û wiha pê de çû: “Em nûçeyan li ser asta Kurdistanî, Rojhilata Navîn û cîhanî dişopînin. Xebatên me ji dema avabûnê û heya niha li ser bingehê dengê heqîqetê berdewam dikin. Dibe ku em heya niha nebibin dengê hemû civakan, lê hewldanên me di vî alî de hene.

Ji bo ku kiryarên li her çar parçeyên Kurdistanê têne kirin, ji raya giştî re were ragihandin, pêwîst e em gavên hîn xurtir bavêjin. Herwiha kiryar û işkencên ku li ser gelê Kurd û li ser asta her çar parçeyên Kurdistanê tên meşandin, li dijî vê yekê xebateke aktîf tê meşandin. Di heman demê de bi têkoşîna xwe ya ragihandinê em ê bibin heqîqet, ji ber eşkerekirina têkoşîn û berxwedaniya gelê dide meşandin, parçeyek ji Rojnamevana ye.”

**‘Em hevkarên heman êşê ne’**

Nûçegihana Ajansa ANF’ê Roj Denîz axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Berî ku ez bibin rojnemevan, ez jinek ji vê civakê bûm. Herwiha çawa ku jinên civaka me ew sîstem û kiryar li ser hatiya meşandin, bi vî rengî li ser min jî hate meşandin. Heta ku Rojnamevaneke karibe dengê jinekê derxe pêwîst e hevkarê heman êşê be. Ji ber vê yekê hewldanên me berdewam ku em dengê gel û jinên civaka xwe bighînin raya giştî.”

FENER



## Dema ku vîn li gorî sponseran be hêvî bê wate dibe!

**Idrîs Henan**

Tevî ku carek din ji bo herdu taxên Helebê Şêx Meqsûd û Eşrefiyê agirbest hatiye ragihandin, lê dîsa jî liv û tevgera komên girêdayî Wezareta Berevaniyê ya hikûmeta veguhêz a HTŞ, nîşan dike ku a fêlbaziyek di dewrê de ye. Li gorî peymana agirbestê diviyabû derhal dorpêça li ser herdu taxan bihata rakirin û rewş li gorî peymana 1 Nîsanê bûya ku vîna gelên li herdu taxan a xwebirêvebirinê were naskirin û rêz jê re were girtin. Tevgerên bi goman, ji nû ve guhertina pozisyona leşkerî, destserkirina malên taxên Helebê yên li ser sînorên herdu taxan in, debokirina çek û cebilxane, bicihkirina sekvanan, li kêleke bendên kontrolê yên hevbeş, hinek bendên cuda avakirin û mewzîgirtin, tecîz, tade, heqaret, revandin û bîlasebeb binçavkirin, hemû nêzîkatiyên ku niyeta aliyê dîtir ê peymanê eşkere dikin. Her wiha diyar dibe ku hikûmeta veguhêz a HTŞ vîna xwe radestî sponserên desthilatdariyê kiriye û li ser têlên faşîzma Tirk cilên xwe radixe. Dema ku kesekî ku qaşo serokê Sûriyê xwe ragihandiye derkeve ber ekranan û ji beşek gelê vî welatî re bibêje; yan hûnê xwe radestî me bikin an jî wê Tirkiyê hesab ji we bixwaze! mirov wê ji vî kesî bendewarê çi hêviya xêrê be? Ango hişmendiyeke ne tenê ferdperest, lê belê başverûtiyek feudal a organeke nepixandî ku derewên xwe bawer dike ye.
Ji ber van sedemên genetîk ên rêxistinek ewqas îradeya xwe radest biyaniyan kiriye, her metirsiya pêkanîna komkujiyan li dar e ku sivîlên herdu taxan bi awayekî bi rêk û pêk werin hedefgirtin. Ji xwe dem mirov li êrişa organîzekirî ya sosyal medyaya ji aliyê berpirsên vê hikûmeta defakto tê birêvebirin binêre, tê digihêje ku heyamekî guncaw a pêkanîna komkujiyan amade dikin. Ew yek jî dihêle ku gelên herdu taxan û derdorên demokratîk di nava xof û fikaran de bin ka wê ev komên bi nav girêdayî Wezareta Parastinê ya HTŞ ne, lê perspektîvên xwe ji Tirkiyê werdigirin û dor li herdu taxan şidandine wê çi bikin û xwedî niyetek çawa ne? Diyar e ku derba vê dawiyê piştê hewldana êrişên li ser herdu taxan xwarine, hiştiye ku li hesabên xwe çend caran vegerin. Lê di heman demê de berxwedana efsanewî ya herdu taxan kulek di dilê wan, faşîzma Tirk û berdevkên wê de çêkiriye ku ewqas ketine nava heyecanê. Lew re jî; çi liv û tevgera li dora herdu taxan hebe, ne livek leşkerî ya normal e, lê belê ji nû ve xwerêxistinkirin û guhertina stratejî û tektîkê ye. Ji ber vê sedema naskirî naba xew bikeva çavan û her lebitîneke wan li dora herdu taxan fena êrişeke derûnî were hesibandin ku dixwazin aliyê psîkoljîk de îradeya gelên herdu taxan têk bibin û di heman demê de manewiyata endamên xwe restore bikin ku karibin di demek guncaw de, ji nişkê ve, bi kîn û nefret komkujiyan pêk bînin.
Weke encam; divê were zanîn ku tişta li herdu taxan li hemberî êrişan hatiye raberkirin, vîna gelê şoreşgerî ye. Wê rêbaza berxwedanê ku taybet li Helebê ceribandî û bi ser ketiye, nasnameya projeya jiyana hevbeş parastiye û ji her kesî re îsbat kiriye ku; ti kes nikare vîna gelê rêxistinkirî bişkîne û ne jî çi hêz û teknelojî bin, dikarin li hember berxwedana wan xwe rabigirin. Nêzîkatiyên berpirs û hestiyar ku li gorî ruhê demê ne, dikarin rê li ber dubarekirina komkujiyên li Beravê û Siwêdayê bigirin. Ancax Şêx Meqsûd û Eşrefiyê bin ku karibin hişmendiya her tiştî dadiqurtîne têk bibin û kapasîteya wê diyar bikin.